

Serkarê Weşanxaneyê Zengezûrê Hejarê Şamil:

Wê xebata Zengezûrê bi Înstîtuyê re xurtir bibe!

HEVPEYVÎN: SALIH KEVIRBIRÎ



Avakar û serkarê Weşanxaneya Zengezûrê

Hejarê Şamil

“Wê xebata Zengezûrê bi Înstîtuyê re xurtir bibe”

SALIH KEVIRBIRÎ

Kurdên Sovyeta Berê bi awayeke giştî li Ermenistan, Gurcistan, Rûsya, Azerbaycan, Ûkrayna û li welatên Asya Navîn dijîn. Kurdên Asya Navîn jî li Kazakîstan, Ozbekistan, Tirkmenîstan û Qirgizîstanê dijîn. Di nav wan welatan de kurd herî kêr li Qirgizîstanê dijîn û bi awayeke fermî hejmara wan li dora 14 heta 20 hezar kesî ye. Li vî welatê ku hejmara xwendevanên kurdî bi qasî tiliyên du destan kêr in, weşanxaneyê kurdî hatiye vekirin û heta niha bi têra xwe kitêbên kurdî pêşkêşî kitêbxaneya kurdî kiriye.

Weşanxaneya Zengezûrê sala 2006ê ji hêla rojnameger û nivîskarê kurd Hejarê Şamil ve li Bîşkeka paytexta Qirgizîstanê hatiye avakirin. Hejarê Şamil kurê rewşenbîr, şaîr û kurdologê kurd ê navdar Şamil Eskerov e. Şamil Eskerov di dema Sovyetê de, li seranserê Azerbaycanê xwediyê yek ji mezintirîn kitêbxaneyê bû.

Hejarê Şamil herçiqas ev demek e li Rûsyayê jî dijî, di serdaneke min a Bîşkeka paytexta Qirgizîstanê de derbarê Weşanxaneya Zengezûrê de bersiva van pirsên min dabû...

Salih Kevirbirî:

Ezbenî beriya her tiştî malavahiya cenabê te dikim ku li vî welatê Asyaya Navîn, li ser sînorê Çînê tu xizmeta çand, dîrok, edebiyat û zimanê kurdî dikî. Gelo bi çend peyvan be jî dikarî ji min re bibêjî; heta niha di bin

banê Weşanxaneya Zengezûrê de çend kitêb anga berhem ronahî dîtine?

Hejarê Şamil:

Spas dikim ji bo vê derfeta ku tu didî min. Cara yekem e ku ezê derbarê weşanxaneya me de bersiva rojnamegerekî bidim. Ez bêm ser pirsê te. Di bin banê Weşanxaneya Zengezûrê de heta niha bêhtirî 20 kitêb hatine çapkirin ku piraniya van kitêban bi zaravayê kurmançî ne. Çend kitêb jî bi rûsî û tirkî hatine çapkirin, lê dikarim bi serbilindî bibêjim ku tevahiya kitêban li ser çand, huner, wêje û siyaseta kurdan in. Di rojên pêş de wê weşanxaneya me gelek kitêbên din pêşkêşî kitêbxaneya kurdan bike. Ev jî bila bi saya vê gotûbêja me bibe mizgîniyek.

Salih Kevirbirî:

Serxêrê be! Kekê Hejar ez dibêm Zengezûr yekemîn weşanxaneya kurdî yan jî kurdan e li seranserê Qefqasyayê û Sovyeta Berê ne wisa? Taybetmendiya sereke ev e, ne wisa?

Hejarê Şamil:

Belê rast e Salih Can! Herwekî cenabê te jî diyar kir, balkêşiya Weşanxaneya Zengezûrê ew e ku ne tenê li Qirgîzîstanê, lê li tevahiya welatên Sovyeta Berê yekemîn weşanxaneya kurdî ye. Rast e, li gelek welatên mîna Ermenistan, Gurcistan û Rûsyayê 'kitêbên kurdî/kitêbên li ser kurdan' hatine weşandin, lê tevahiya wan kitêban di weşanxaneyên fermî yên wan dewletan de hatibûn weşandin û belavkirin. Ji ber vê yekê ye ku Weşanxaneya Zengezûrê, li gorî bîr û baweriya min bixwe jî di warê çapemenî û weşangeriya kurdî de dezgeheke girîng e.

Salih Kevirbirî:

Ezbenî, bi qasî em dizanin gelê kurd ji sala 1937ê ve anga piştî fermana Stalîn ve li Qirgîzîstanê dijî. Gelo tu dikarî behsa heyam an jî serdemekê bikî ku kitêbên kurdî tê de hatine çapkirin?

(Pêşî hinekî dibişire, paşê dibersivîne) *Dikarim li ser vê pîrsa te ya girîng vê yekê bibêjim; heta sala 2006ê, ne bi kurdî, ne jî li ser kurdan kitêbek jî nehatibû weşandin.*

Hejarê Şamil:

Şayanê gotinê ye ku Hejarê Şamilê ku ji Herêma Kurdistana Sor e, sala 1966ê li bajarê Kelbecerê hatiye dinyayê. Sala 1989ê li Bakûya Azerbaycanê Enstîtuya Pedagojiyê temam kiriye, di navbera salên 1984-1986an de leşkeriya Artêşa Sor kiriye. Şamilê ku ji nêveka salên 1980yî dest bi karê rojnamegeriyê kiriye, sala 2006ê li Bîşkeka Qirgizîstanê bi cih dibe. Piştî jiyana bêhtirî 10 salên li Bîşkekê, ev 5-6 sal in ku li Rûsyayê jiyana xwe berdewam dike. Hejarê Şamil li Rûsyayê tevî çend rewşenbîrên kurd Înstîtuya Kurdî ya li Rûsyayê ava kiriye. Weşanxaneya Zengezûrê jî, vê gavê xebatên xwe di nava înstîtuyê de dimeşîne. Hejarê Şamil herwiha endamekî çalak ê Komeleya Yekbûnê û Televizyona Yekbûnê ye ku ev herdu dezgeh vê gavê di bin serkariya Profesora Kinyazê Îbrahîm de kar û xebatên xwe berdewam dikin.

Salih Kevirbirî:

Ji bo xebata Zengezûrê tu tenê bûyî yan komeke we ya weşanê hebû?

Hejarê Şamil:

Ya rast bibêjim mecalên me pir û pir kêmbûn, niha kêmtir in jî. Xebat bîmin tenê destpê kir, ez tenê bûm. Paşê komeke me çêbû ku ji van kesan pêk dihat: Gulşena Mûsayê Beşkî, Viktoriya Boytsova û Kamîz Şeddadî. Heta ji van dost û kesayetiyên hêja dihat, me hewla başkirina xebatên weşanxaneyê dida. Piştî ez ji Asyaya Navîn çûme Rûsyayê, wekî min got wê xebata weşanxaneyê bi înstîtuya me re baştir bimeşin. Di rojên pêş de hêviya min ew e ku em komeke xurt saz bikin û careke din kar û barê weşangeriya kurdî, bi awayeke xurtir berdewam bikin.

Salih Kevirbirî:

Siheta te xweş, ez jî hêviyên xwe tevli hêviyên te dikim. Gelo çima Zengezûr? Ev nav ji ku tê?

Hejarê Şamil:

Dema Kurdistana Sor hat avakirin, herêma Zengezûrê mezintirîn dever ango herêm bû. Ev dever bi ser wîlayeta Yelîzavetpolê ve bûye ku sala 1868ê de hatiye avakirin. Sala 1921ê herêma Zengezûrê di navbera Azerbaycan û Ermenistanê de hate dabeşkirin. Bi gotineke din weşanxaneya me navê xwe ji herêmeke pir xweş ê Kurdistana Sor standiye.

Salih Kevirbirî:

Heger tu navê çend berhemên Weşanxaneya Zengezûrê ji me re bibêjî, ewê kîjan bin?

Hejarê Şamil:

Kerem bike navê çend berhemên Weşanxaneya Zengezûrê:

- 1- 'Çelovek Legenda, (Mirovê Efsane), 110 Saliya Mele Mustefa Barzanî, E. Ziyô Bedirxan, 2013
- 2- 'Zimanê Kurdî. Bona dersxane II-V', Kinyazê Îbrahim, kurdî, 2006',
- 3- 'Zimanê Kurdî. Bona dersxane VI-IX', Kinyazê Îbrahim, kurdî, 2006',
- 4- 'Jiyan di rêya welatparêziyê de', biyografî, kurdî, 2007'
- 5- 'Dîlbera min', Barîyê Bala, helbest, kurdî, 2008
- 6- 'Berevok' Wezîrê Nadirî, kurdî, 2009
- 7- 'Kulîlkên neçilmisî', helbest, kurdî, 2011
- 8- 'Axîna Dil' Hesenê Hecîsilêman, helbest, kurdî 2011
- 9- 'Êşa Dil, Evdille Îbrahîm Şemoî, helbest, kurdî, 2011
- 10- 'История Кавказского Курдистана' (Tarîxa Kurdistana Kafkasyayê) Wekîl Mustafayev, lêkolîn, rûsî, 2011
- 11- 'Rêbera Axaftinê', Rûsî-Kurdî, Kamîz Şeddadî, 2012

Salih Kevirbirî:

*Xebatên li ber destê te hene ku di demên pêş de bikevin nav refên
Kitêbxaneya Kurdî?*

Hejarê Şamil:

Helbet hene! Em vê gavê amadekariya sê kitêbên nû dikin:

- 1- Ferhenga Beşavendên (kafiye) Kurdî.
- 2- 2- Ferhenga Rûsî-Kurdî (40 hezar peyv)
- 3- 3- Sed Kurdên Sovyetê.

Salih Kevirbirî:

*Kekê Hejar, wekî em dizanin li seranserê welêt û dîyasporayê bi dehan
kitêbxane û weşanxaneyên kurdan hene. Gelo têkiliya Zengezûrê bi
kitêbxane, sazî û dezgehên weşangeriya kurdan re çawa ye?*

Mixabin têkiliyên me zêde tunene. Hêdî hêdî çêdibin. Yekitiya
Nivîskarên Dihokê kitêba Bariyê Bala ku me weşandibû bi tîpên aramî
jinûve çap kir. Carcaran gazî dikin, çend sal berê min serdana başûr kir.
Lê ez dixwazim ev serdan zêdetir bibin.

Salih Kevirbirî:

Gelekî spas dikim ji bo vê gotûbêjê, kêfxweş bûm.

Spasxweş, ez jî kêfxweş bûm...

salihkevirbiri@gmail.com
hejareshamil@hotmail.com

Kurdên Sovyeta Berê bi awayeke giştî li Ermenistan, Gurcistan, Rûsya, Azerbaycan, Ûkrayna û li welatên Asya Navîn dijîn. Kurdên Asya Navîn li Kazakîstan, Ozbekîstan, Tirkmenîstan û Qirgîzîstanê dijîn. Di nav wan welatan de Kurd herî kêr li Qirgîzîstanê dijîn û bi awayeke fermî hejmara wan li dora 14 heta 20 hezar kesî ye. Li vî welatê ku hejmara xwendevanên Kurdî bi qasî tiliyên du destan kêr in, weşanxaneyê Kurdî hatiye vekirin û heta niha bi tîra xwe kitêbên Kurdî pêşkêşî kitêbxaneyê Kurdî kiriye.

Weşanxaneya Zengezûrê sala 2006ê ji hêla rojnameger û nivîskarê Kurd Hejarê Şamil ve li Bîşkeka paytexta Qirgîzîstanê hatiye avakirin. Hejarê Şamil kurê rewşenbîr, şair û kurdologê Kurd ê navdar Şamil Eskerov e. Şamil Eskerov di dema Sovyetê de, li seranserê Azerbaycanê xwediyê yek ji mezintirîn kitêbxaneyê bû.

Hejarê Şamil herçiqas ev demek e li Rûsyayê jî dijî, di serdaneke min a Bîşkeka paytexta Qirgîzîstanê de derbarê Weşanxaneya Zengezûrê de bersiva van pirsên min dabû...

Salih Kevirbirî: Ezbenî beriya her tiştî malavahiya cenabê te dikim ku li vî welatê Asyaya Navîn, li ser sînorê Çînê tu xizmeta çand, dîrok, edebiyat û zîmanê Kurdî dikî. Gelo bi çend peyvan be jî dikarî ji min re bibêjî; heta niha di bin banê Weşanxaneya Zengezûrê de çend kitêb angî berhem ronahî dîtine?

Hejarê Şamil: Spas dikim ji bo vî derfeta ku tu didî min. Cara yekem e ku ezê derbarê weşanxaneyê me de bersiva rojnamegerekê bidim. Ez bêm ser pîrsa te. Di bin banê Weşanxaneya Zengezûrê de heta niha bêhtirî 20 kitêb hatine çapkirin ku pîraniya wan kitêban bi zaravayê Kurmancî ne. Çend kitêb jî bi Rûsî û Tirkî hatine çapkirin, lê dikarim bi serbilindî bibêjim ku tevahiya kitêban li ser çand, huner, wêje û siyaseta Kurdan in. Di rojên pêş de wê weşanxaneyê



me gelek kitêbên din pêşkêşî kitêbxaneyê Kurdan bike. Ev jî bila bi saya vî gotûbêja me bibe mizgîniyek.

S.K: Serxêrê be! Kekê Hejar ez dibêim Zengezûr yekemîn weşanxaneya Kurdî yan jî Kurdan e li seranserê Qefqasyayê û Sovyeta Berê ne wisa? Taybetmendîya sereke ev e, ne wisa?

H.Ş: Belê rast e Salih Can! Herwekî cenabê te jî diyar kir, balkêşîya Weşanxaneya Zengezûrê ew e ku ne tenê li Qirgîzîstanê, lê li tevahiya welatên Sovyeta Berê yekemîn weşanxaneya Kurdî ye. Rast e, li gelek welatên mîna Ermenîstan, Gurcistan û Rûsyayê kitêbên Kurdî/kitêbên li ser Kurdan hatine weşandin, lê tevahiya wan kitêban di weşanxaneyên fermî yên wan dewletan de hatibûn weşandin û belavkirin. Ji ber vî yekê ye ku Weşanxaneya Zengezûrê, li gorî bîr û bawerîya min bi xwe jî di warê çapemenî û weşangeriya Kurdî de dezgeheke girîng e.

S.K: Ezbenî, bi qasî em dizanin gelê Kurd ji sala 1937ê ve angî piştî fermana Stalîn ve li Qirgîzîstanê dijî. Gelo tu dikarî behsa heyam an jî serdemekê bikî ku kitêbên Kurdî tê de hatine çapkirin?

H.Ş: (Pêşî hinekî dibîsire, paşê dibersivîne) Dîkarim li ser vî pîrsa te ya girîng vî yekê bibêjim;



S. K.: *Siheta te xweş, ez jî hêviyên xwe tevli hêviyên te dikim. Gelo çima Zengezûr? Ev nav ji ku tê?*

H. Ş.: Dema Kurdistan Sor hat avakirin, herêma Zengezûrê mezintirîn dever ango herêm bû. Ev dever bi ser wîlayeta Yelizavetpolê ve bûye ku sala 1868ê de hatiye avakirin. Sala 1921ê herêma Zengezûrê di navbera Azerbaycan û Ermenistanê de hate dabeşkirin. Bi gotineke din weşanxaneya me navê xwe ji herêmeke pir xweş ê Kurdistan Sor standiye.

heta sala 2006ê, ne bi Kurdî, ne jî li ser Kurdan kitêbek jî nehatibû weşandin.'

S.K.: *Ji bo xebata Zengezûrê tu tenê bûyî yan komeke we ya weşanê hebû?*

H.Ş.: Ya rast bibêjim mecalên me pir û pir kêmbûn, niha kêmtir in jî. Xebat bi min tenê dest-

1 Şayanê gotinê ye ku Hejarê Şamilê ku ji Herêma Kurdistan Sor e, sala 1966ê li bajarê Kelbecerê hatiye dinyayê. Sala 1989ê li Bakûya Azerbaycanê Enstitûya Pedagojiyê تمام kiriye, di navbera salên 1984-1986an de leşkeriya Artêşa Sor kiriye. Şamilê ku jî nîveka salên 1980yî dest bi karê rojnamegeriyê kiriye, sala 2006ê li Bîşkeka Qirgîzîstanê bi cih dibe. Piştî jiyana bêhtirî 10 salên li Bîşkekê, ev 5-6 sal in ku li Rûsyayê jiyana xwe berdewam dike. Hejarê Şamil li Rûsyayê tevî çend rewşenbîrên Kurd Înstîtûya Kurdî ya li Rûsyayê ava kiriye. Weşanxaneya Zengezûrê jî, vê gavê xebatên xwe di nava înstîtûyê de dimeşîne. Hejarê Şamil herwiha endamekî çalak ê Komeleya Yekbûnê û Televîzyona Yekbûnê ye ku ev herdu dezgeh vê gavê di bin serkariya Profesora Kinyazê Îbrahîm de kar û xebatên xwe berdewam dikin. (Salihê Kevîrbîrî)

pê kir, ez tenê bûm. Paşê komeke me çêbû ku ji van kesan pêk dihat: Gulşena Mûsayê Beşkî, Viktoriya Boytsova û Kamîz Şeddadî. Heta ji van dost û kesayetiyên hêja dihat, me hewla başkirina xebatên weşanxaneyê dida. Piştî ez ji Asyaya Navîn çûme Rûsyayê, wekî min got, wê xebata weşanxaneyê bi înstîtûya me re baştir bimeşin. Di rojên pêş de hêviya min ew e ku em komeke xurt saz bikin û careke din kar û barê weşanxaneya Kurdî, bi awayeke xurtir berdewam bikin.

S.K.: *Siheta te xweş, ez jî hêviyên xwe tevli hêviyên te dikim. Gelo çima Zengezûr? Ev nav ji ku tê?*

H.Ş.: Dema Kurdistan Sor hat avakirin, herêma Zengezûrê mezintirîn dever ango herêm bû. Ev dever bi ser wîlayeta Yelizavetpolê ve bûye ku sala 1868ê de hatiye avakirin. Sala 1921ê herêma Zengezûrê di navbera Azerbaycan û Ermenistanê de hate dabeşkirin. Bi gotineke din, weşanxaneya me navê xwe ji herêmeke pir xweş ê Kurdistan Sor standiye.

S.K.: *Heger tu navê çend berhemên Weşanxaneya Zengezûrê ji me re bibêjî, ewê kîjan bin?*



H.Ş: Kerem bike navê çend berhemên Weşanxaneyê Zengezûrê:

1-Çelovek Legenda, (Mirovê Efsane), 110 Salîya Mele Mustafa Barzanî, E. Zîyo Bedirxan, 2013.

2-Zimanê Kurdî, Bona dersxane II-V', Kin-yazê Îbrahîm, Kurdî, 2006.

3-Zimanê Kurdî. Bona dersxane VI-IX', Kin-yazê Îbrahîm, Kurdî, 2006.

4-Jîyan di rêya welatparêziyê de, biyografî, Kurdî, 2007.

5-Dîlbera min, Barîyê Bala, helbest, Kurdî, 2008.

6-Berevok, Wezîrê Nadîrî, Kurdî, 2009.

7-Kulîlkên Neçilmisî, helbest, Kurdî, 2011.

8-Axîna Dil, Hesenê Hecîsilêman, helbest, Kurdî, 2011.

9-Êşa Dil, Evdille Îbrahîm Şemoyî, helbest, Kurdî, 2011.

10-История Кавказского Курдистана, (Tarîxa Kurdistana Kafkasyayê) Wekîl Mustafayev, lêkolîn, Rûsî, 2011.

11-Rêbera Axaftinê, Rûsî-Kurdî, Kamîz Şedadî, 2012.

S.K: Xebatên li ber destê te hene ku di demên pêş de bikevin nav refên Kitêbxaneyê Kurdî?

H.Ş: Helbet hene! Em vê gavê amadekariya sê kitêbên nû dikin:

1-Ferhenga Beşavendên (kafiye) Kurdî.

2- Ferhenga Rûsî-Kurdî (40 hezar peyv)

3- Sed Kurdên Sovyetê.

S.K: Kekê Hejar, wekî em dizanin li seranserê welêt û diyasporayê bi dehan kitêbxane û weşanxaneyên Kurdan hene. Gelo têkiliya Zengezûrê bi kitêbxane, sazî û dezgehên weşangeriya Kurdan re çawa ye?

H.Ş: Mixabin têkiliyên me zêde tunene. Hêdi hêdi çêdibin. Yekitiya Nivîskarên Dihokê kitêba Barîyê Bala ku me weşandibû bi tîpên aramî jinûve çap kir. Carcaran gazî dikin, çend sal berê min serdana Başûr kir. Lê ez dixwazim ev serdan zêdetir bibin.

S.K: Gelekî spas dikim ji bo vê gotûbêjê, kêfxweş bûm.

H.Ş: Spasxweş, ez jî kêfxweş bûm...✍

Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ

Li Navsera Kavîlê Kela Hêviyê **Rojen Barnas** ■ Newala Qesaban **Mûsa Anter** ■ Yek heye li vî gundî **Berken Bereh** ■ Zûgotinokên Kurdî û Taybetiyên Wan **Murad Celalî** ■ Ez xulamê qermer im **Mewlana Celaleddînê Romî** ■ Kes li heqê ma nêperso **Melayê Cizîrî** ■ Ji Bihûsta Serhedê Dengbêjek Evdîrehmanê Perê **Kenan Söylemez** ■ Ji pêla duyem Halkûyên Heftane û Du Haibûn **Sîdîq Gorican** ■ Mele Weysiye Soktîlî û Mele Hesenê Bazîdî **Mele Mihemedê Kêrsî** ■ Çem û Şîko û Ez **Abdullah Incekan** ■ Nameya Seyîd Tahayê Nehrî ya ji Şêx Ebdurehman Qutub re **Hanîfî Taşkun** ■ Ji ber **Ziver İlhan** ■ Camên di lê te **Bamed Serdar** ■ Serkarê Weşanxaneyê Zengezûrê Hejarê Şamil Wê xebata Zengezûrê bi Institutê re xurtir bibel **Hevpeyvîn: Salih Kevîrbîrî** ■ Mergê Cemîla **Netice Altûn Demir** ■ Hey Hewarî **Ahmed Arif Wergera ji Tirkî: Talat İnanç** ■ Serencama me **Emin Xursî** ■ Esqê Ser Kaniya Derewîn **Rahmetullah Karakaya** ■ Kîlame Elîyê Purto û Dewazê Pîrmusî **Evdî Hesqera Kûçîk Sabahattin Ali** ■ Medet ya Rebl **Zeynep Çelik** ■ Teyrîko **Kevok Mizgin** ■ Kolombîre **Dîno Buzattî** ■ Demsa **Evdîxaliqê İsa** ■ Helbesta Şîna Şêx Selim a Seydayê Xasî **M. Zana Karak** ■ Şaîrên Nav Wendayên Kurd 5- **Elî Kemal Bapîr (Kemalî)** Min bîbexşîne **Azad Rêbîwar** ■ Rîtûel **Rûbar Elî** ■ Feryada Jina Kurd **Vehbî Vural** ■ Roja bêşevî **Semî Rêzan Diljen** Hewara Cihanê **Mele Feysel** ■ Nasname **Ebrû Yılmaz** ■ Mikus **Mela Tahirê Tetwanî** ■ Dengvedanî Derengtiyayî **Dilazad A.R.T** Şopên Kûr **Seyîd Demîrkîran**

Kurd: Neviyên Nûh

Rohat Alakorn

Şahbanûya Helbesta
Modern a Kurdî:

Diya Ciwan û Zikata Evîna Wê

M. Zahir Ertekin

Serhildana Bidlîsê Çawa dest pê kiriye?

M. Sadîk Varlî

Berbanga Kurdên Qazaxistanê

Abdurrahman Behek



156

SAL: 29
CILD: 25
HAVIN: 2021
BIHA: 15 TL



